



## Beşdariya firavînê- Dibistanên Navîn

Gelî xwendekar, gelî dê û bav

Hemû xwendekar vexwendîne firavîna li qantîna dibistanê.

### Heqê xwarinê çiqas e?

Heqê xwarinê hûn dikarin ji dibistanê bipirsin. Hûn ê mesrefan her heyv ji pêşî ve bişînin hesabê benqê yê xwediyê qantîne.

### Dê heqê firavînê çawa bê dayîn?

Hewce nake hûn ji dest bidin. Dayin bi kartên tên kirin. Lê hûn dikarin ji dest jî bidin. Lê bi vî awayî dibe ku heqê firavînê dê hinekî din zêdetir be.

### Em kartê ji kû pêyde dikin?

Hûn ê "MIAjunior-Ticket"ê roja pêşî ya dibistanê ji dibistanê pêyde bikin. Hûn ê "OldenburgCard"ê jî bi hêman awayî ji dibistanê pêyde bikin. Vejarte: Heke hûn xizmetê ji Pakêta Perwerde û Beşdarî (BuT) distînin hûn ê "OldenburgCard"ê ji Amt für Teilhabe und Sozialesê an jî Jobcenterê pêyde bikin.

### Girîng! Razandina pera li kartê:

Divê hûn di cih de pera razînin kartê. Lê belê hûn piştî vê dikarin li qantîne bi qartê xwarinê bixwin.

Dê nameyek li derheqê vê sîstemê re têkildar bê ji we re.

Wextê hûn beşdarî firavînê bûn divê her kêlî di qertê de biqasî heqê firavînê pere hebin, ev girîng e.

### Heke kart li malê bê ji bîr kirin dê çi bibe? Heke pere li kartê nehatibin razandin dê çi bibe?

Di vê rewşê de heqê firavînê tenê ji dest dikare bê dayîn. Lê belê bi vî awayî dibe ku hinekî din zêdetir be.

### Bi "Pakêta Perwerde û Beşdarî" (BuT) erzanî

Heke hûn xizmetê ji Pakêta Perwerde û Beşdariyê (BuT) distînin **hewce nake** hûn ji bo firavînê heq bidin. Ji bo vê yekê divê hûn karta xwe ("MIAjunior-Ticket" an jî "OldenburgCard") her kêlî bînin qantîne.

### Vexwarin û xwarinên li qantîne:

Hûn di navberên dersan de dikarin tiştên vexwarin û xwarinê jî bikirin. Perê van ji dest tê dayîn. Ji bilî vê li gelek dibistana bi kartê jî dibe.

### Xizmeta ji ser Internetê: "Mensamax"

Li bajarê Oldenburg bernama înternetê ya "MensaMax" tê bikaranîn. Hûn dikarin firavîna xwe pêşî ji wir sparîş bikin û perên xwe yî mayî bibînin. Divê hûn ji kompîtereke girêdana wê ya internetê heye bi navê xwe yê bikarhêner bikevin bernameyê. Hûn ê nameyeke ku agahiyên ragihanî tê de ne ji dibistanê pêyde bikin.

### Pirsên we hene?

"ServiceCenter" a bajarê Oldenburg bigerin. Telefon: 0441 235-4444.

